# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (168):

## Gundê "Me'imila", mirina jinekê piştî lêdanê, veşartina zorane û girtinên bêsûcane, desteserkirina zeytûna, kolandina gireke kevneşopî, geregoşî û serberdayetî, teqîna bombeyekê

























Li ser bingeha pêngavên siyaseteke rêbazkirî di talana sermiyanên Efrînê de û bêparkirina xelkê ji pêdiviyên jiyankirina wan, û zêta zeytûna jêdera serekîn jê, "Tîma Bazirganî ya Istîxbaratî ya Turkî" kirîna zêtê di xwe de dorpêç dike û bi nirxeke nizim (/37/ dolar Amrîkî û berjêr ji her tenekek zêt /16/KG zelal, kêmtirî nirxên ku li bazarên Sûriyê hene bi dora/20/dolaran), di heman dema ku destlatên Turkiyê herêmê ji hindir Sûriyê cuda dikin, dorpêç dikin, û diravê xwe ji bo danûsitandin û bazirganiyê ferz dikin.

**Vaye li jêr jî komek ji binpêkirin û tewanan:**

**= G"Me'imila":**

Bi Navça "Reco" ve girêdayî ye, /17/KM ji navenda wê dûr e, ji dora /450/malî pêkhatî ye, dora du hezar nişte ji nişteciyên Kurd ên resen tê de bûn, di roja pêşî ji şer de li ser herêmê tev penaber bûn, jê dora /350malbat=hezar nişte/ -piranî temenmezin- vegerîn, û/20malbata=110nişte/ji anîndeyan tê de hatin niştecîkirin.

Milîseyên "Firqit Elsultan Mihemed Elfatêh" gund desteser kirin, û piraniya heyîn û kelûpelên malan dizîn, ji xwarinvexwarinê de bigir, ta firaxên baqirî, alav û amûrên taqeta elektirîkê, cerên gazê, şaşên tilvizyonan û hin tiştên din, zêtê zêtûna, bi dehan seriyên pêz, tirektorên çandiniyê, otombîl û matorên dutekerî, jê du makîne yên "Hisên Eloko, Mihemed Osman Birîmo" -piştî dandina vêrgiyên diravî hin jê hatin vegerandin- û herweha jî dizîna guheztok(tirens) û hin keblên toreya elektirîkê ya giştiyane.

Û milîseyan malên "Ehmed Sebrî Şewqî, Mihemed Farês Farês" bê sedem şewitandin, û avahiya şaredariyê û mala "Mihemed Miho Henan" jî kirin du biryargehên leşkerî.

Û wan dest danîn ser dora /1500/darên zeytûnê yên koçberên zorane, jê /300/dar ên "Bekir Eloko" ne, rêjeya /3-5/% li ser berhema werzên zêtûna yên hemwelatiyên li gund û /50%/ li ser ên ne li gund ferz dikin, firotina tenekên zêtê yên vala di nûnerê xwe de dorpêç dikin û bi hezar diravên Sûriyê ji nirxa li bazarê buhatir, herweha kirîna "Simaqê" jî di werzê de di nûnerê xwe de dorpêç dikin û bi nirxeke ji bazarê kêmtir bi du hezaran, û li vê Havînê hemwelatî "Mistefa Reşîd Zênkê" hate kotekirin û bi vêrgiya diravî hate cezakirin, ji ber ku wî tibabeke Simaqê kirîbû û guhestibû derveyî gund.

Bi ser de jî piraniya darên ihracê yên çiyayên li dor gund (Şikeft, Bena Piling, Zinarê Qulheftarê, Bena Sor, Rêşiya Diza, Bena Hûşê...), /300/darên zêtûnê yên "Ehmed Rif'et Ce'ifer" li sala 2020an Z bê wijdan, û dareke Sinoberê ye temenmezin di nav zeviyeke zeytûna ye malbata Pakrewan "Ebid Elhemîd Zîbarî" de, ji bo êzingkirin û bazirganiyê qut kirin.

Û xelkê gund rastî rengereng binpêkirinan hatin, ji revandin û girtinên bêsûcane de bigir ta işkencekirin, kêmrûmetkirin û peresitandin û tiştên din. Di vê warî de, bi tuhmeta têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re bi dehan ji xelkê gund hatin girtin, jê girtina ciwan "Dozyar Ehmed Kurdî /25/sal" ji destpêka Cotmeha 2019an Z ve, û paşê bi tuhmeta "revandina /60/terman - li gor ragîhandina Şalyarê hundirîn yê Turkiyê/Ajansa Anedolê li 20.11.2019an Z" yên kuştiyên Gundê "Eyn Deqnê" û endamên "Artêşa Azad - Elceyş Elhur" bi tirambêla "Lodir", û gerandina wan li nav kolanên Bajarê Efrînê li Avrêla 2016an; Guhestin bi xwe berevajîkirine ji mada /49/an ji "Hevpeymana Cinêvê ya Çaran" re, ya ku "qedexe dike ku bi neçarî û di bin zorê de çi bi tenêtî yan komelîn guhestin û rêwîkirin ji kesên parastî re -çi sivîl bin an şervan- ji erdên wan ên dagîrkirî bo erdnîgariyên dewleta dagîrker were kirin...Sedem çi dibe bila be". Divê were zanîn ku "Dozyar" ciwanekî sivîl e, û di nav refên hêzên ewlehiyê û leşkeriyê de, li ba Rêvebiriya Xweser a berê tu caran xizmet nekiriye.

Û li orta Avrêla 2020an Z jî, Hey'it Tehrîr Elşam(Nesra berê) li "Idlibê", xort"Betal Hesen Hesen/24/sal" ji xelkê gund bi qurşînê kuşt, piştî ku berî dora heft heyvan Destlatên Turkiyê li Wîlayeta Hetayê ew girtin û radestî "Elnesre" li Derbasgeha "Bab Elhewe" kirin; Divê bê zanîn ku xort û malbata xwe ve, li sala 2012an Z, piştî ku rewş li Taxa Şêx Meqsûd -ciyê ku berî penaberbûnê lê dijiyan- xerab bû, berê xwe dan Turkiyê.

**= Mirina jinekê piştî lêxistinê:**

Li 13.10.2021an Z, hemwelatî "Ne'imet Behcet Şêxo - zayend Gundê "Qopê/Hemşelek" - Navça Reco - sala 1988an Z" di Nexweşxana "Ibin Sîne de - Bajarê Efrînê" jiyana xwe ji dest da, piştî ku nexweşiya wê lê giran bû, di encama lêdan û tirsê ku di biryargeha Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" ya nêzîk Kastîna "Azadî" ya li Orta Efrînê vêre çêbûye de. Divê were zanîn ku hemwelatiya vêsûc û bêguneh di heyva şeşan de ducanî bû û di bijîşkxanekê de bû, lê dema ku mêrê wê "Xelîl Ne'isan Mûse" tevî du xortên din ji gundê wî "Ebdo Umer Ebdo, Mistefa Namî Ebdo", di kêlîdema teqîna makînak bombekirî (ya ku bi yek kîlomitir li Rojavayê wan û li nav bajêr) li Roja Duşemê li ser Nîvro 11.10 2021an Z, bi behaneya ku yê dawiyê bi xilyewî deng kiriye girtin, rabûn çûn jinik jî ji bijîşkxanê anîn, hemî lêkolîn û işkence kirin, û piştî tenduristiya jinikê ne baş bû hemî berdan, da ku wê bibin nexweşxanê.

Lê, ji tirsa belavbûna nûçeya girtina wan û mirina jinikê bi wê sedemê, meriv û hevjîna wê û herdu xortên din, ditirsin ku ji nû ve werin girtin û işkencekirin, bi ser ku wan tu daxuyanî nedan û nejî tu gilî ji bo wê pêşkêş kirin.

**= Veşartina zorane û girtinên vêsûcane:**

- Ta niha hemwelatî "Arîn Mihemed Dilî Hesen/25/sal - ji heft heyvan ve mêrkirî û ducanî" ji xelkê Gundê "Kîmarê" - Şêrewa li ba Milîseyên "Asayêşê - Ewlehiya Rêzanî" li Efrînê bi rengekî zorane veşartî ye, bê tu

têkildarî bi merivên xwe yan girtina parêzerekî yan pêşkêşkirina wê ji dadgehkirinê re. Divê bê zanîn jî ku ew ji aliyê Milîseyên "Firqit Elhemze" ve li 12.10.2021an Z, bi rengekî zorane hate revandin/girtin; Û berê jî "Arîn" li Reşmeha 2020an Z, ji aliyê heman milîseyan ve hatibû revandin, û di biryargeha wan de (Avahiya Asayêşê ya berê li Hirşê Mehmûdiyê - Bajarê Efrînê) bi rengekî zorane hatibû veşartin, û ew di nav giropeke ji jinên ku ji wir derketine de bû, piştî ku Milîseyên "Artêşa Elîslam- Ceyş Elîslam" li 28.5.2020an ew desteser kirine, û paşê jî ji Hepsa Maratê li 23.12.2020an Z hatibû berdan.

**Û Destlatên Dagîrkeriyê jî ev kes girtin:**

- Ji bêtirî bîst rojan ve, hemwelatî "Mihemed Reşîd Mihemed/44/sal" ji xelkê Gundê "Qopê/Hemşelekê" - N.Reco, bê ku sedem were diyarkirin.

- Li 7.10.2021an Z, hemwelatî "Îmad Cum'e kurê Osmên, Azad Osman kurê Hisên, Yekbûn Milet Elî kurê Enwer" ji karmendên kampaniya ava vexwarinê li Efrînê, û "Reşîd Dodix kurê Mihemed" ji karmendên Benda Meydankê, bi tewanbariyên têkeliyê bi (R.X) a berê re, û piştî çend rojan û ferzkirina vêrgiyeke diravî li ser wan, ji bilî "Yekbûn Elî" hemî hatin berdan; Û li 17.10.2021an jî hemwelatî "Reşîd Hemo kurê Hesen/53/sal" ji xelkê Gundê "Kumreşê" û ji karmendên heman kampaniyê û bi heman tuhmetê, û piştî rojekê û ferzkirina sezayeke diravî li ser, ew berdan.

- Li 12.10.2021an Z, hemwelatî "Almaz Xelîl Hac Ebdo/27/sal" ji xelkê Bajaroka "Kefirsefrê" - Navça Cindirêsê, bi behaneya ku ew li ba (R.X) a berê mamosteya dibistanê bû, û ta niha bendkirî ye.

- Li 17.10.2021an Z, piştî ku ev hemwelatî "Mizgîn Mihemed/28/sal, Sozan Fadêl/33/sal" ji xelkê Gundê "Birîmce" û "Lîlav Hemîd Mistefa/27/sal" ji xelkê Gundê "Misteşûra" vexwendin navenda Navça Mabeta, bi behaneya ku wan li ba "R.X" berê mamostetî kirine, û piştî rojekê ji bendkirinê û ferzkirina cezak diravî ew berdan.

- Li 17.10.2021an Z, neh din ji hemwelatiyên G."Me'imila" - N.Reco, bi tuhmeta têkeliyê bi "R.X" a berê re, jê "Reşîd Reşîd Zîbar/56/sal, Ehmed Mihemed Xelîl Zîbar/45/sal, Selah Ehmed Ibrahîm/38/sal, Esmet Hesen Eloko/35/sal, Hisên Mihemed Ibrahîm/67/sal, Qaziqlî Emîn Farês/45/sal", û piştî rojekê ji bendkirinê û ferzkirina /1200/ PT li ser her yekî ji wan hatin berdan, bi mercê ku ew bace bibe /2000/PT dema ku biryara sezakirinê were derxistin.

**= Werza Zêtûna:**

Dizîn û ferzkirina vêrgiyan li ser berhema werza zêtûna li herêmê berdewam dibe. Li Bajaroka "Mabeta" û gundên "Hisê/Mîrka, Birîmce, Şîtka, Misteşûra, Reca, Çomezna, Elîcara, Me'ireskê, Xaziyana, Şiketka, Tirmûşa, Erendê û Mistika", bi nêzîkbûna werzê re, Milîseyên "Elcebhe Elşamiyê" destên xwe danîn ser hemî zeviyên zeytûna yên hemwelatiyên ne beşdar, ta ku yê şûngirek ji ber xwe ve danîbe jî, û berhemên wan talan kirin, bê ku beşekî ji berhemê ji bo xerciyên du salan ên xizmetguzariyê û pêdiviyên çandiniyê re bihêlin.

Û li Gundên"Maratê, Bablît, Keferşîl, Xelnêr, Gazê û Gundê Mezin" Elcebhe 33% vêrgî li ser berhema zêtê ya hemî hemwelatiyên ku li derveyî herêmê ferz kir.

**= Kolana Girê "Bircebdalo":**

Ji du heftan ve Milîseyên "Hêzên Taybet (Elqiwat Elxase) - Feyleq Elşam" ya ku "Ebdela Helawê" serkêşiyê dike, Girê "Bircebdalo" yê kevneşopî, bi alavên giran û bi serpereştiya Istîxbaratên Turkiyê, ji bo lêgerîna li kinz û kevneşopan û dizîna wan, kolan û tevdan, û li Havîna 2019an Z jî cara yekê gir hate kolan û rêşkirin. Û bi bîr were jî ku heman milîseyan kargeheke şênberên tevzînokan li G."Bircebdalo" - Şêrewa bi rêve dibirin, ji aliyê "Asayêşa Leşkerî" ve li Cindirêsê, li 3.10.2021an Z hate servebirin, û ta niha Destlatên Dagîrkeriyê, encamên lêkolînên xwe, kî di ber kargehê de berpirsiyar in û rê û aliyên firotina berhema wê, nedane ragîhandin.

**= Şewatek li daristanekê:**

"Berevaniya sivîl li Efrînê - Eldîfa'i Elmedenî" got ku tîmên wê li Roja Şemiyê 16.10.2021an Z, agirek bi daristaneke ihracê li Gundê "Xaziyana" - N.Mabeta ketibû vemirandin, û rûbera daristanê /2/hiktar bû û ziyan jî dora /300/dar bû; Bi bîr were jî ku gund di bin desteseriya Milîseyên "Elcebhe Elşamiyê" de ye, û

çekdar jî ji bo êzingkirin û bazirganiyê daran bi mebest qut dikin, û hin caran jî êgir bi daristanan dixin, da ku li ser qutkirinê veşêrin an ji bo qutkirina zêdetir ji daran re, bi behaneya ku hişk bûne.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

Di encama hilgirtina tewşankî ji çekan re, ji aliyê yên li Herêma Efrînê hatine niştecîkirin ve van bûyeran rûda:

- Li 16.10.2021an Z, û piştî pevçûnekê û avêtina qurşînan di navbera hin anîndeyan de li Bajaroka "Meydanekbezê" - N.Reco, ciwan "Fewaz Ridwan Bakîr" ji Bajarê "Humsê" hate kuştin.

- Ji dora deh rojan ve, û piştî pevçûnekê di navbera hin anîndeyan de, li pêş Nanpêjgeha otomatîk li Bajarê Cindirêsê, ciwan "Zekeriye Ebid Elhemîd Elbaz" ji xelkê Gundê "Ercûn - Elqisêr" - gundewarê Humsê bi derbeyên kêran û hin din birîndar ketin, lê ji ber xedarbûna birîna wî, ew li 20.10.2021an Z di nexweşxaneyeke Turkiyê de mir.

**= Teqîna bombeyeke zemînî:**

Li 17.10.2021an Z, di encama teqîna bombeyeke zemînî de ye ji bermayên milîseyên çekdar, li nêzîk Gundê "Tilsosîn" - Herêma Elşehba'i li gundewarê Bakurê Heleb, çar xortên negîhayî ji koçberên Efrînê (Diyar Mihemed Ebdo/15/sal, Serhed Mihemed Tarî/14/sal, Nabo Cim'e Erebo/14/sal, Ishaq Ibrahîm Tarî/13/sal) rengeren birîndar bûn, ew bo Nexweşxana "Avrîn" ji bo dermankirinê hatin şandin, lê "Nabo" ji ber birîna wî ya xedar bo Heleb hate rêkirin.

Turkiyê li rex şerên xwe yen leşkerî û rêzanî, şerekî aborî jî li dijî xelkê Efrînê didomîne, bi rengê terora dewletî li dijî pêkahateyeke nijadî ye resen li ser axa xwe ya dîrokî û di dewleteke cîran û endam di Netewên Yekgirtî de dijî.

24.10.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**
- Êrişkerî û talana nandozên Turkiyê ji milîseyan ji G."Me'imila" - N.Reco re, Reşmeha 2018 Z.
- Girtî "Dozyar Ehmed Kurdî".
- Pakrewan "Betal Hesen Hesen".
- Kuştiya vêguneh "Ne'imet Behcet Şêxo".
- Veşartiya zorane "Arîn Mihemed Dilî Hesen".
- Kolana Girê "Bircebdalo" ya kevneşopî - Şêrewa, bi acetên giran, Cotmeha 2021 Z.
- Şewatek li daristaneke nêzîk G."Xaziyana" - N.Mabeta, 16.10.2021 Z.
- Yek ji zarokên ku di teqîna bombeyeke zemînî de, li G."Tilsosînê" - Herêma Şehba'i yê gundewarê Bakurê Heleb birîndar bûne, 17.10.2021 Z.